

## Delegasyonên Kedê – „Werin, em bi hev re Rojava biparêzin, kolektîf kar bikin û jiyana komînal avabikin!“

Têkoşîna gelê Rojava ji gellek aliyan ve di nava wan 10 salên dawî de li seranserê cîhanê deng veda. Di nava alozî, qeyran û şer de li ser xaka Rojavayê Kurdistan û Bakur-Rojhilatê Suriyê projeyekî nimûne tê pêkanîn. Bi vîn û îradeya gelên herêmê li beramberî zilm û zordarî berxwedan çêbû, axa vê welatê ji dagirkeran hat rizgarkirin, li hemberî DAÎŞ‘ê hat parastin û Rêveberiya Xweser li ser esasî biratiya gelan hate avakirin. Ji 2012‘an ve gelê Rojava hewldide li ser esasî paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jin de xwe rêxistinbike û bi vî awayî jiyanekê bi rûmet û azad li welatê xwe pêşbixîne. Bi xwîna deh-hezaran şehîd, bi ked û xwêdana gelê xwecihî destkeftiyên mezin çêbûn, di nav de têkoşîna azadiya jinê, avakirina sîstemekê xwerêvebirina herêmî a demokratîk, pêkanîna mafên hebûn, rêxistinbûn û xwe-îfadekirina hemu netew, çand, bawerî û zimanên herêmê. Di demekî de ku li tevahiya Rojhilata Navîn alozî, şer û qeyran li ser esasî netewperestî, nîjadperestî, zilamsalarî û olperestî mezin dibe û hêzên kapîtalîst ên navnetewî projeyên xwe yê mêtîngeriya nûjen dixwazin ser gelên herêmê ferz bikin, Rojava mîna nefesekî nû ya însaniyetê ket ser dîkeya dîrokê. Li ser esasî fikra netewa demokratîk ku ji aliyê Abdullah Öcalan ve hate pêşxistin bi şoreşa Rojava re hêviyekê nû ji bo jiyanekê azad, aştîyane û bi rûmet zindî bû. Lê heta îro berdewamiya vê projeyê mîsoger nebûye. Ev 9 salan Rojava di bin embargoyekê giran de hebûna xwe didomîne. Her wekî din Rojava ev 9 salan bênavber rûbirûyî êrîşên dijwar ên dagirkeriyê ye û hewldide bi her awayî xwe li hemberî vê biparêze. Herêmên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî îro ji aliyê Dewleta Tirk ve hatine dagirkirin û gefa êrîşên nû rojane tê kirin. Bi wê ve girêdayî av li ser herêmê tê qutkirin û konseptekê berfireh a şerê taybet tê birêvebirin da ku krîz, alozî û tevliheviyê di nava herêmên Rêveberiya Xweser de derbikevin. Li kêleka vê gelê Rojava nîşandaye ku di bin şert û mercên bi vî rengî ên herî zor û zehmet de jî, mirov bixwaze dikare jiyana xwe bi destê xwe avabike. Di vê çarçoveyê de rastiya şer li herêmê nebûye sedem ku gelê Rojava hewl nede xewn, xeyal û fikrên xwe di derbare jiyanekê demokratîk de pêkbîne. Bi kedekê mezin gel li gund û taxên xwe bi riya komînan xwe birêxistinbûn û ji jêr ber bi jor ve xwe-rêveberiya xwe avakirîye. Bi rengê koperatîfan hewl tê dayîn şewazê hilberandina bîedalet a kapîtalîst gav bi gav were derbaskirin. Di nava îmkanên kêr de projeyên enerjîyê û jiyanekê ekolojîk tîn pêşxistin. Sîstema xwendinê ya dibistanan ji binî ve nû hatiye destgirtin, da ku êdî hemu zarok bikaribin bi zimanê xwe yê dayîkê bixwînin. Ji sifirê ve gav bi gav sîstemekê aborî tê pêşxistin da ku Rojava bikaribe li ser lingên xwe bi xwe bisekine. Di aliyê civakî de jî têkoşînekê mezin hat dayîn û tê dayîn, da ku hişmendî û kiryarên zayendperest, zilamsalar, nîjadperest û olperest werin derbaskirin û jiyanekê wekhev, bi edalet û azad bê pêşxistin. Li herderê jin û ciwan xwe xweser birêxistinbûn û kar û xebatên berfireh dimeşînin ji bo civakekê xwedî îrade û zindî avabikin û azadiya jin misoger bikin.

Gelê Rojava li hemberî dagirkerî û faşîzmê di nava berxwedanê de ye û di nava şert û mercên zor û zehmet de jiyana xwe birêvedibe û avadike. Wekî çend rêxistin û tevgerên li Rojava em hatine cem hev û me **Şebekeya Dostaniya Navnetewî** avakir. Di nava dîroka têkoşînên gelên bindest de piştgirî û dostaniya navnetewî hertim yek ji sîlahên me yê herî xurt bû. Dostanî jî mijarekê gotinê nîne, divê bê pratîzekirin, were pêkanîn, bê jiyankirin: Li Îspanya 1936‘an hat pratîzekirin, li Angola 1975 hat pêkanîn, li Vîetnamê 1968‘an hat jiyankirin, mînakên wê bê dawî ne. Îro jî li welatên wekî Filistin û Kuba tê pratîzekirin. Ji bo piştgirîdayîna têkoşînên azadiyê li gellek welatan „Taburên Enternasyonal“ di dîrokê de hatine birêxistinbûn. Em jî îro bi navê „Delegasyonên Kedê“ dixwazin vê kevneşopiyê li

Rojava carekê din zindî bikin Em dixwazin derfetek bidin hûn bikaribin welatê me û rastiya têkoşîna me nasbikin, bi me re ked û xwêdanê bidin, da ku em bi hev re têkoşîna xwe ya navnetewî ji bo jiyaneke komînal û azad mezin bikin.

Ji bo naskirina Rojava, ji bo şikandina embargoya aborî û siyasî li ser Rojava û ji bo pratîzekirina dostaniya navnetewî em bang li hemu kesên demokrat, sosyalîst û şoreşger dikin: „**Werin, em bi hev re Rojava biparêzin, kolektîf kar bikin û jiyana komînal avabikin!**“

Yekemîn delegasyonên kedê wê buhara 2022'an destpêbikin. Bernameya me di nava 21 rojan de nîqaş û semînerên siyasî, aktivîteyên sosyal û çandî, karê pratîkî di nav koperatîf û gundan de û serlêdana cih û warên girîng ên Rojava di nava xwe de dihewîne.

Hemu bername hûn dikarin li vir mêzebikin: ([link](#))

Heger pirsê we hebin, yan hûn dixwazin navê xwe ji bo delegasyoneke qeyd bikin, ji kerema xwe re li ser vî email ji me re binivîsin: (...)

**Şebekeya Dostaniya Nevnetewî,  
Cotmeh 2021**